



Australian
BORDER FORCE

Important information on mandatory quarantine for passengers travelling to Australia

Agahiyên grîng derheqê tevdêrên îzolekirina îcbarî de (veqetandinê) bo rêwiyên digihên Australya

13/08/2020

Bi encama nexweşiya korona COVID-19, Australya sînorkirina seferê û tevdêrên îzolekirina îcbarî bi cîh kirin.

Hemî rêwiyên digihên Australya divêt li şûna yekemîn ya gihîştina Australya bo 14 rojan werin îzolekirin.

Şûneke bo bicîhbûna di vê demê de de bo rêwiyên were dayîn û de ji bo wan qedexe be beşdare sefera hindirî bibin (çûna mala wan jî di nav de). Ew ê nikaribin sefera xwe bo şûneke din li welêt jî bidomînin ta 14 rojên îzolekirina îcbarî (veqetandinê) bi dawî dihên.

Tevdêrên îzolekirinê ji aliyê hukûmetên wîlayetan û herêman ve (*territories*), bi piştgiriya ji hukûmeta australî dihên bi-rêvebirin. Li pîrraniya wîlayetan û herêman dayîna beşekî ji mesrefê bicîhnûnê de ji te were xwaztin.

Rêwiyên tranzît

Rêwiyên seferên navneteweyî yên digihên Australya dikarin beşdare seferêke din ya navneteweyî (*international flight*) bibin ku ji bajarê ew digihên derdikeve. Rêwiyên tranzît divêt

- ji firrokaneyê dernekevin ger dikin bi dirêjîya ta 8 saetan li benda firrîna firroka xwe bimînin
- biçin şûna îzolekirina îcbarî ya ku hukûmeta wîlayetê daniye, ger dikin bi dirêjîya 8 ta 72 saetan li benda firrîna din bin

Qedexe ye rêwiyên tranzît biçin sefera di nav Australya de, heta ger bo siwarbûna firrokeke sefera navneteweyî li bajarekî din be.

Çi dema gihîştina Australya dihêt çaverêkirin

- Divêt ligor rêberiyên ji karmendên firrokê û mamûrên dewletê bikî dema digihêyî Australya.
- Tu de çenteyên xwe rakî û derbase tevdêrên adetî yên derbasbûnê bibî (gumrig, pasport û tehqîba ewlehiya biyolojî-kîmawî).
- Li dû tehqîbkirinê û derbasbûnê, mamûrên dewletê de te bigihînin otobûsan ku de te bibin şûna bicîhbûnê.
- Heye ku bo demeke dirêj li benda gihîştina şûna bicîhbûnê bimînin. Mamûrên dewletê de hewl bidin ta mumkin e dema li-bendêmayîne hêsan (rehet) bikin. Hevkarî û sebra te cîhê spasdariyê ne.

Tevdêrên bo 14 rojên veqetê (îzolekirinê)

- Mamûrên dewletê de li şûna îzolekirinê li benda gihîştina te bin. Ew ê bi kêfxweşî li dû gihîştina te bersîvên pirsên te bidin û amade bin di dema veqeta te de bi te re alîgir bin.
- Li şûna bicîhbûnê hemî hewcedarî û xizmetên di dema mayîna te de pêwîst de hebin. Şûneke bi ewlehî û pak, xwarin û vexwarin û alîkariya pijîşkî de li şûna bicîhbûnê hebin.
- Ger pêdiviyên te yên pijîşkî hebin, wek raçêtên dermanê berdeyam, tevdêrên hêskirina bidestxistinê de bihên girtin.
- Heye ku têsta (tehqîba) bo COVID-19 di 48 saetên destpêkê de bo te hebe, û dû re di navbera rojên 10emîn û 12emîn yên veqetê de. Ger tu qayîl nebî, heye ku tu bo demeke dirêjtir werî îzolekirin. Mercên derheqê tevdêrên têtstkirinê de di dest hukûmeta wîlayetê û herêmê de ne.
- Ligor qanûna bi navê 'Biosecurity Act 2015' û qanûna eleqedar ya wîlayetê, divêt tu li şûna îzolekirinê bî ta ku rewşa te ya pijîşkî (tenduristiya te) rêya têtetina nav şênîyê Australya li pêş te vidike.

Van tevdêran de ji aliyê hukûmetên wîlayetan û herêman ve bihên bicîhkirin, bi piştgiriya dayîreyên Hukûmeta Australî.

Dawîhatina 14 rojên îzolekirinê

Bi qedandina dema îzolekirina îcbarî re, dikarî edî beşdare sefera di nav Australya de bibî. Haydar be ku hukûmetên wîlayetan û herêman (*territories*) heye ku xwediyên pêdiviyên têtetînê û îzolekirinê bin. Baştir e pêş seferê xwe derheqê pêdiviyên têtetînê û îzolekirinê de agahdar bikî.

Di malpera Wezareta Tenduristiyê ya Hukûmeta Australî de navnîşanên malperên agahdariyên derheqê sînorkirinên bi seferê we girêdayî hene: <https://www.health.gov.au/news/health-alerts/novel-coronavirus-2019-ncov-health-alert/coronavirus-covid-19-restrictions/coronavirus-covid-19-advice-for-international-travellers#quarantine-for-incoming-travellers>

Important update relating to all passengers arriving to Australia - ABF factsheet - 12092020 - Kurdish Kurmanji